

# Fîlma av û hewayê > Pergala av û

## hewayê

Av û hewa çi ye? Mirov dikare av û hewayê wekî guherînûn di av û hewayê di dirêjîya demê da bi nav bike. Hêmanên cûr bi cûr ên pergala av û hewayê girêdayî hevdu ne û bi hev va kar dikin. Av û hewa herdem bi awayekî domdar guheriye., û gelek hokarên xwezayî û mirovî tê da rolekê dilîzin. Di 30-40 salên derbasbûyî da, me dîtiye ku av û hewa ew qasî zû diguhure ku nikare tenê ji ber hokarên xwezayî be û gellek rastî hene ku nîşan didin dinya germ dibe. Panela NY bo av û hewayê hema hema gihîştîye vê bawerê ku hokara wê ya herî mezin karê mirov e ku bûye sebaba zêdebûna gazên gulxaneyî li atmosfêrê da û bandora gazên gulxaneyî zêde dike.

Beriya ku hûn fîlmê bibînin, karên ku hûn gerek bikin ev in:

1. Cudahiya nava av û hewayê û rewşa hewayê çi ye?
2. Çi bandorê datîne ser germahiya erdê?
3. Av û hewa di dirêjahiya hezaran salî da çawan guheriye?


Erk û karên têkildarî fîlmê:

1. Pergala av û hewayê ji kîjan hêmanan pêk hatiye?
2. Çima nava deverên ser xetê nîveka erdê û deverên cemserê ew qasî germahî ji hev cuda ye?
3. Bibêjan ka ev cudahiyan nava deverên ser xeta nîveka erdê û deverên cemserê çawan dikarin ser tevgerên bayê û pehnavan bandorê dayînin. Wêneyên li jêrê di şiroveyan da bi kar bînin.



4. Êlnîno û La Nîna navên du mînakên rewşên dijwar ên hewayê li derya û atmosfera Pehnava Aramê ne ku di navberên nediyar da pêk tên. Taybetmendiyan Êl Nînoyê vebibêjin.
5. Mînakekê bidin ku Êl Nîno li qadeka berfireh a erdê ser mînakên rewşa hewayê bandorê datîne.
6. Li rûdanên Êl Nîno yên dîrokî binêrin û bibêjin ku çima guherînên biçûk di pergala av û hewayê da dikarin bo av û hewayê vî erdê dûhatên mezin bi xwe ra bînin?

7. Lêkolîner çawan navoka cemedê bo diyarkirina germahiyê û asta CO2`yê di çend sed hezar salên berê da diyar dikin?
8. Xêza kovankî ya li wêneyê jêrê wan germahiyan nîşan dide ku di 400000 salan da pêk hatine. Vê xêta kovankî bo diyarkirina vê yekê bi kar bînin ku gelo serdemeka cemedê yan serdema navbera cemedan da li 400000 salên beriya bûyîna Mesîh, 200000 sal beriya bûyîna Mesîh û sala 1850`yê piştî bûyîna Mesîh hebûye yan na?



9. Hokerên germahiya navgîn ser erdê dikare çi bibe ku di 400000 salên borî da guheriye?
10. Em dikarin bibêjin ku nava CO2`yê û xêza kovankî ya germahiyê di 400000 salên borî da pêwendiyek hebûye. Hewl bidin têgeha "pêwendiyê" şirove bikin.
11. Piştî sala 1850`yê, asta CO2`yê di atmosferê da bi awayekî berbiçav zêde bûye. Çi bûye sebaba vê pêla zêdebûnê?
12. Çima lêkolîner bi bawe rin ku asta zêdebûyî ya CO2`yê li atmosferê dê bibe sebaba zêdebûna germahiya navgîn ser erdê?
13. Têgeha ``Feedbak(Piştewanê) şirove bikin.
14. Cemeda deryayê ku berf ser bibe tîrêja rojê bi qasî 85-90% vedigerîne, lê ava deryayê tenê 10% vedigerîne. Giya û hêşînahî û axa tarî nêzîkî 20% tîrêjê vedigerînin. Eger cemed bihelin, li gorî we çi yê ser germahiya erdê rû bide?
15. Sê mînak ji `Piştewanê` bînin.

### Erk û karên xurtbûyî:

1. Diyar bikin La Nîna çi ye. Çima em Êl Nîno qonaxeka germ û La Nînoyê jî qonaxeka sar bi nav dikin ?
2. Rêbazên cûr bi cûr ên ku lêkolîner diyarkirna guherînên berê di av û hewayê da bi kar tînin.
3. Çima diyarkirina encamêka tekane û diyar wekî hokara guherînên av û hewayê dijwar e ?